# Rojnamevanekî Siyasetmedar û Rojnameyeke Muxalif: Mewlanzade Rifat û Rojnameya *Serbestî*

## "A Politician Journalist and An Opponent Journal: Mewlanzade Rifat and *Serbestî* Journal"

Seîd VEROJ

**KURTE:**

Mewlanzade Rifat, şexsiyetekî namdar û girîng ê tevgera neteweperwer a Kurd e di destpêka serdema 20an de. Ew, bi nasnameya xwe ya rojnamevanî, nivîskarî û siyasetmedarî tê naskirin. Digel rojnameya *Serbestî*, rêvebirî û berpirsyariya derxistina gelek weşanên din jî kiriye ku di vê meqaleyê de navê wan derbas dibin. Ji nav wan weşanan ya herî temendirêj *Serbestî* ye.

Weşana rojnameya *Serbestî*, dem deman bê rawestandin jî, bêtirî diwanzdeh salan berdewam kiriye. Di nav weşanên wê demê yên Kurdan de, ji xeynî *Serbestî*, rojname û weşaneke wisa temendirêj nîne. Bêguman di wê dema dirêj de, di polîtîkaya weşana *Serbestî* de jî guherîn çêbûne; ku ew guherîn di vê xebatê de, bi ser sê serdeman ve hatine destnîşankirin. Serdema yekem, ji destpêka çapkirina rojnameyê bigire heta biryara sirgûnkirina Dîwana Herb-î Urfî ya 21ê Nîsana 1909yê dewam kiriye. Serdema duyem, ji dema sirgûnkirina Misrê dest pê dike û heta dawiya sala 1912yê dewam dike. Serdema sêyan jî, ji navbereke dûrûdirêj a nêzîkî pênc salan şûn ve dest pê dike û di vê serdemê de *Serbestî,* weşanek bi girêdayî Cemiyeta Tealiya Kurdistanê (Komela Pêşxistina Kurdistanê) ve hatiye weşandin. Di dewreya sisêyan de, bi vê yekê ve girêdayî, naverok û temaya nivîsan jî guheriye. Di vê serdemê de Mewlanzade Rifat, êdî endam û serkirdeyekî aktif ê tevgera neteweyî ya Kurd e.

**Bêjeyên sereke:** Serbestî, Mewlanzade Rifat, rojnamegeriya Kurdî, Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (Komeleya Pêşxistina Kurdistanê).

*** Nivîskar-lêkolîner, edîtorê Kovara Bîrê**
Author-researcher, editor of Bîr Journal.
kovarabir@hotmail.com

**ABSTRACT:**

Mewlanzade Rifat was a renowned and significant figure of the Kurdish nationalist movement at the beginning of the 20th century. He was known by his identities as a journalist, a writer and a politician. Beside the journal *Serbestî*, he acted as the executive and administrator of many other publications which are mentioned in this article. Among all those, *Serbestî* was the longest-lasting one.

Although with intervals from time to time, the journal *Serbestî* was published for more than twelve years. There are no other Kurdish journals or publications of those times that lived as long as *Serbestî* did. Of course, there were occasional alterations in the editorial policy of *Serbestî* during that long time, which are addressed in this work in three periods. In the third period, *Serbestî* was published as an organ linked to the Kurdistan Tealî Association. As a result of that fact, the content and theme of the articles changed in that period. The first period, starts from the publication of the journal and lasts until 21st April 1909, the Martial Court's resolution for exile. The second period starts from the time of exile in Egypt and lasts until the end of 1912. The third period starts after a long lasting pause of about five years, and *Serbestî* becomes a publication of the Society for the Rise of Kurdistan. In line with that new function, the content and theme of the articles also changed during that period. It is when Mewlanzade Rifat becomes one of the activists and leaders of the Kurdish national movement.

**Keywords:** Serbestî (Liberation), Mewlanzade Rifat, journalism, Kurdish journalism, society for the rise of Kurdistan

*"Sed qa'îme û qesîde kes naykirrê be pûlê*
*Rozname û cerîde kewtote qîmet û şan."*
**Hecî Qadirê Koyî**

## 1. DESTPÊK

Dema behsa qonaxa sereke ya rojname û rojnamegeriya Kurdan bê kirin, bêguman divê navê rojnameya Serbestî û Mewlanzade Rifat, di xetên pêşî de bêne lêkirin. Serbestî, yek ji rojnameya herî temendirêj a salên dawî yên dema Dewleta Osmanî û destpêka sedsala 20an e

Xwedî û midurê berpirsyar ê Serbestiyê Mewlanzade Rifat; kesayetekî namdar, mutefekir û têkoşerekî girîng ê wê demê ye. Ew, bi xebat û nasnameya xwe ya rojnamevanî, siyasetmedarî û dîplomatî tê naskirin. Her wiha hosteyekê polemîkê û xwediyê qelemeke tûj bû.

Di vê xebata berdest de, li gor çavkaniyên heyî, bi giranî dê aliyê wî yê rojnamevanî,

siyasî û têkiliya wî ya bi tevgera Kurd û Kurdistanê re derkeve pêş. Ji destpêkê hetanî dawiyê, fikir û ramanên Mewlanzade Rifat, siyaseta weşandina rojnameya Serbestî û ew guherînên fikrî û siyasî yên ku di nava demê de bi wî re çêbûne, bi ser sê qonaxan ve hatine dabeşkirin.

## 2. MEWLANZADE RIFAT KÎ YE?

Mewlanzade Rifat, kurê nivîskarê navdar Ebdurrehman Nacim (Veroj (Kürt Tarihi), 2016: h. 22) e. Bi eslê xwe ji başûrê Kurdistanê, ji mîrekên Silêmaniyê ye û endamê malbateke navdar û ji giregirên wî bajarî ye. Ew, neviyê kesayetiyekî navdar ê wê deverê Mihemed Beg e û malbata wan bi leqaba xwe ya Mewlanbegzade têne nasîn.

Mewlanzade Rifat, di sala 1869an de li bajarê Stenbolê ji dayik bûye. Roja ji dayikbûna wî diyar nebe jî, li gor nameya wî ya ji Nabî Begê Sefîrê Atînayê re ku di 15yê Hezîrana 1909ê (Rifat, 2009: 70) de rêkiriye, ew roj di çil saliya xwe de bûye. Li gor vê yekê, ew di sala 1869an de ji dayik bûye. Dema em li kar û wezîfeyê bavê wî yê wê demê binêrin, diyar e ku ew li bajarê Stenbolê ji dayik bûye. Agahdariyên me yên li ser zaroktî, xwendina seretayî û navîn, jiyana wî ya malbatî, perwerdeyî û siyasî pirr kêm in û ne bes in.

Li ser perwerdeyî û jiyana wî, lêkolîner Murad Issı wiha dibêje:



Mewlanzade Rifat, *Serbestî*, h.145

"Mewlanzade Rifat Beg, Mekteba Huqûqa Şahane xwendiye. Piştî xelaskirina mektebê, demekê di Qelema Matbûatê Ecnebiye de kar kiriye. Ji ber jêhatîbûn û serkeftinên wî, hatiye terfîkirin ji bo Qelema Tehrîrat a Muteserrifiya Beyoglu. Û ji wê şûn ve jî, hatiye tayînkirin ji bo miduriya hepisxaneya bajarê Sînopê. Li ser şikayeta Muteserrifiya Sînopê, di roja 22yê Tebaxa 1895ê de der heqê wî de lêpirsîn hatiye kirin û di encama wê de li wî bajarî hatiye girtin... Demekê li Sînopê girtî dimîne, paşê bi biryareke nû wî sirgûnî bajarê Çorumê û ji wê derê ve jî rêdikin Qeyseriyê." (Issı, 2010: h. 196) Ali Birinci jî dibêje: "Li ser vê dema jiyana wî, tiştê ku tê zanîn ev e, ku di sala 1896ê de li bajarê Qastamonuyê

katibiya xusûsî ya walî Xelîl Beg kiriye." (Birinci, 2001: 381) "Li ser sirgûniya wî jî du sebeb têne diyarkirin: Ya yekem, hal û hereketên wî yên nemunasib; yê duyem jî, terefdariya wî ya ji bo Sultan Reşadê V. e." (Issı, 2010: h. 196)

Li gor nivîsandin û ewraqên fermî, Mewlanzade Rifat, heta Adara sala 1905an li Qeyseriyê girtî bûye. Ew bi îddiaya nêzîkbûna bi Sultan Mehmed Reşat re tê tawanbarkirin û 12 sal ceza ji bo wî tê birrîn. Ji ber vê, wî bi cezaya sirgûnê rêdikin bajarê Sen'aya Yemenê. Lêbelê nayê zanîn ku di kîjan tarîxê de ji Qeyseriyê rêkirine Yemenê. Mewlanzade Rifat van rojan di nav tengasiyên gelek mezin û tunebûnê de derbas dike. Piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem, efûyeke giştî tê derxistin û wekî gelek sirgûniyan ew jî vedigere Stenbolê.

### 3. DERKETINA EFÛYÊ Û VEGERA STENBOLÊ

Di 24ê Temûza 1908ê de bi tevî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem, efûyeke giştî tê derxistin û Mewlanzade Rifat jî dikeve ber vê efûyê û vedigere Stenbolê. Mewlanzade Rifat di bîranînên xwe de li ser îlankirina Meşrûtiyetê wiha dibêje: "Roja 23yê Temûza 1908ê bi rastî jî cejneke millî ye û hêjayê pesindanê ye. Bayê vê roja hêja jiyan lûl kir (taman kir), em jî rizgar kirin û wekî bi hezaran mexdûrên siyasî, ji bajarê Sen'aya Yemenê yanî ji ciyê nefîkirina me ya dawî …" (Rifat, 2009: 21) "Wekî her kesî, me jî berê xwe da wî bajarî û dixwest gavekî zûtir bigîjin Stenbola ku ji tarîtiya reş a îstibdadê, xweşikayiya xwe ya sirûştî wenda kiribû... Hîn di destpêka rêya hatinê de me digot, ku Sultan Ebdulhemîd di meqamê xîlafet û seltenetê de bimîne, ji bo dahatûya welat xeteriyeke mezin e û me jî ditirsîne... Armanca me, rûxandina desthilatdariya Ebdulhemîd bû." (Rifat, 2010: 96-97)

Piştî ku digihîjin Stenbolê, li ser rewş û dîmena siyasî ya wê demê dibêje: "Dema em vegeriyan Stenbolê, rêvebirên Cemiyeta Îttihad û Tereqqî di nav serxoşiya înqilabê de bûn." (Birinci, 2001: 381)

Mewlanzade Rifat, ji vegera Stenbolê şûn ve, li hemberî îstibdadê û ji text daxistina Ebdulhemîd, dest bi muxalefet û têkoşîneke dijwar dike. Dibêje: "Pêşiyê em bi nefîkiriyan re hatin ber hev, bi kurê Şêx Ubeydulahê Nehrî, Seyid Ebdulqadir Efendî re hevdîtin pêk anîn û me pêşniyara yekîtiyê ji Ermenên welatî re kir." (Rifat, 2009: 21)

Di vê navberê de ji aliyê kesên nefîkirî û hin dijraberên îstibdadê ve, bi navê Cemiyeta Fedekarên Milet (CFM) rêxistinek hatibû damezirandin. Mewlanzade Rifat û hevalê wî Hesen Fehmî jî tevlî xebata CFMê dibin. Di 16yê Îlona 1908ê de, li ser navê cemiyetê, di bin berpirsyarî û sernivîskariya Necîp Nadir Beg de rojnameya *Huqûq-î Umûmiye* tê neşirkirin. Necîp Nadir muxalîfekî dijwar ê îstibdadê bû û 23 hejmarên vê rojnameyê bi berpirsyar û sernivîskariya wî têne neşirkirin. Piştî ku Necîp Nadir ji bêgaviyê karê rojnameyê dihêle, li şûna wî endamê cemiyetê Mewlanzade Rifat dibe berpirsyarê rojnameya *Huqûq-î Umûmiye.*

Mewlanzade Rifat bi vê pêngavê, cara pêşiyê dest bi xebata weşangeriyê dike û hetanî hejmara şêstî (60), vî karî dimeşîne. Xebata wî ya di nav CFMê de, zêde dewam nake û Mewlanzade Rifat di bîranînên xwe de dibêje: “Me dît ku kesên biyanî (nenas) tevlî Cemiyeta Fedekaran bûne û ji ber vê yekê em ji cemiyetê veqetiyan û me dest bi neşirkirina rojnameya *Serbestî* kir.” (Rifat, 2009: 28)

Bêguman armanceke Mewlanzade Rifat û hevalên wî û polîtîkayek weşana *Serbestî* hebû. Dema em bala xwe bidin naveroka rojnameyê û çalakiyên Mewlanzade Rifat, diyar dibe ku li gor rewşa siyasî ya demê, di polîtîkaya weşana *Serbestî* de jî guhartin çêbûne.

Divê guherîna polîtîkaya weşana *Serbestî* û fikrên Mewlanzade Rifat, bi ser sê dewreyan (qonaxan) ve bête nirxandin: Qonaxa yekem, ji destpêka weşana *Serbestî* bigire hetanî pêkhatina Bûyera 31ê Adarê ye; dewreya duyemîn, weşana *Serbestî* ya li Misir, Parîsê û ji nû ve li Stenbolê ye; dewreya sêyemîn jî, karkirina *Serbestî* wek organa Cemiyeta Tealîya Kurdistanê (Komeleya Pêşxistina Kurdistanê) ye.

## 4. DERÇÛN Û SERDEMA YEKEM A ROJNAMEYA *SERBESTÎ*

Çawa ku li jorê jî hate gotin, di vê xebatê de, ji destpêka çapkirina rojnameyê bigire heta sirgûnkirina duyemîn a 21ê Nîsana 1909ê, bi navê serdema yekem a *Serbestî* hatiye binavkirin. Politikaya weşana *Serbestî*, di vê serdemê de xwe spartiye van armanc û prensîbên bingehîn: Weşaneke serbixwe ya bêlayen; parastina nirx û destkeftiyên Meşrûtiyetê; têkbirina Îstibdada Ebdulhemîd; di çarçoveya “Osmanîparêzî”yê de pêkanîna sîstema “Adem-î Merkeziyetê”; muxalefeteke çalak a dijberê desthilatdariya Îttihad û Tereqqiyê; parastin û tercumaniya fikrên welatiyên zulmdîtî bêyî ji hev cudakirina dîn û unsûrên ciyawaz.

### 4.1. Xusûsiyetên Teknîkî, Kunye û Ciyê Weşandinê

*Serbestî*, di roja 3yê Teşrîna Sanî ya 1324 (16yê Sermaweza 1908)an de dest bi weşana xwe dike. Hemû hejmarên *Serbestî* li ber destê me tune bin jî, ji 1ê hata 498an, hemû hejmarên rojnameyê di kutubxaneya Beyazid a Stenbolê de peyda dibin. Lêbelê divê li ser rêzehejmarên rojnameyê têbiniyek bê diyarkirin; ew jî ev e ku ji hejmara 245an (31ê Adara 1919) şûn ve di hejmara 1ê Nîsana 1919yê de reqama 456 hatiye lêkirin û hejmarên mayî li gor vê reqamê dom kirine. Bi îhtimaleke mezin li vê derê xeletiyek çêbûye, divê em bala xwe bidinê. Ji xeynî van hejmaran, bi alîkariya lêkolîner Murad Issı hejmarên 595, 596, 597, 598, 600 û 601 jî gihîştin ber destê me, lê mixabin di dema pêkanîna vê xebatê de bi tevî hemû hewldanan, me nikarî em hejmarên mayî bi dest bixin. Li gor agahdariyên heyî, “*Serbestî* li ser hev 770ê hejmar” (Issı, 2010: h. 196) hatine belavkirin.

Li ser bergê hejmara yekê (1.), tarîxa duşema 3yê Teşrîna Sanî ya 1324 hatiye nivîsandin û li ser bergê hejmara 601an jî tarîxa yekşema 25ê Nîsana 1920î hatiye

nivîsandin. Li ser bergê hejmara 1ê û aliyê rast ê nivîsa "*Serbestî*"yê wiha hatiye nivîsandin: Yekşem, 3yê Teşrîna Sanî 1324 (16yê Sermaweza 1908); xwedî û midur: Mewlanzade Mewlanzade Rifat e; ji bo meseleyên îdarî û karê nivîsê muracatî midur bikin; Adres: "Yeni Postane karşısında Ferruh Bey Hanı'nda mahsus daire" (Di Xana Ferrûx Beg de daîreya xusûsî ya li hemberî postexaneya nû); ewraqên ku ji bo rojnameyê bêne şandin nayên vegerandin. Di binê nivîsa "*Serbestî*"yê de wiha hatiye nivîsandin: *"Rojnameyeke rojane ye û bêyî ku li cudahiya cins û mezhebên Osmaniyan binêre xizmeta huqûqa hemûyan dike."* Li aliyê çep ê nivîsa "*Serbestî*"yê jî wiha hatiye nivîsandin: Bihayê abonetiyê: "Ji bo welatê Osmanî, Bulgarîstan, Bosna Hersek, Misir û Girîdê salane 180 û şeş mehane jî 90 quriş e. Ji bo welatên din jî salane 38 frank e. Ji bo îlanan jî muqaweleyên cuda têne çêkirin." (Serbestî, 1908: h. 1)

Li vê derê dixwazim xalekê ronî bikim: Divê bê zanîn ku di wergera tarîxên Rûmî û Hîcrî yên di vê xebatê de, rêbera wergera "Türk Tarih Kurumu"yê hatiye bikaranîn. (http://www.ttk.gov.tr/index.php?Page=Sayfa&No=385)

Li ser bergê hejmara 498an jî ev agahdarî hatine nivîsandin: "Xwedî û midurê wê: Mewlanzade Rifat e; rojnameyeke rojane ye û sala wê ya yanzdehan e; stûnên me ji nivîsên rêya heqîqetê re vekirî ne; nivîsên hatine rêkirin neşir bibin yan jî nebin, nayên vegerandin." (Serbestî, 1919: h. 498) Adres û telefona wê jî wiha hatiye diyarkirin: "Dîvan yolunda *Kadınlar Dünyası*'nda bir özel daire/İstanbul (di rêya Dîwanê de daîreyeke taybet a ciyê kovara *Cîhana Jinan*/ Stenbol), qutiya posteyê 346 û hejmara telefonê jî 2474 e." (Serbestî, 1918: h. 176)

Ji xeynî hejmara 172yan, hemû hejmarên din ên *Serbestî*, di qewareya 40cm x 54cm de hatine çapkirin; her yek hejmara wê 4 rûpel e û di her rûpelêkî de 5 stûn nivîs hatine lêkirin. Hejmara 172yan, wek hejmareke taybet hatiye çapkirin; qewareyê wê 13cm x 19cm ye, bi tevayî 32 rûpel e û di şiklê yek stunê de hatiye lêkirin. Hejmara 7 û 8an, roja 10ê Çiriya Paşîn a 1324an (1908) bi hev re hatine çapkirin. Her wiha roj û hejmara 24ê Adara 1325ê dubare û hejmara 140î jî li pey hev du car hatiye çapkirin.

Nivîsên rojnameyê li gor babetên xwe, di bin sernivîsên stûnên cûrbicûr de hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "*Siyasiye*" de, meqaleyên siyasî yên di rojevê de ne hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "*Hudûd-î Daxiliye*" û "*Hudud-î Xariciye*"yê de jî, nûçeyên hundir û derve hatine nivîsandin. Bi piranî di rûpelên dawî de jî nameyên xwendevanan hatine belavkirin. Di gelek stûnan de nivîsên bêîmze hene û di hinek hejmaran de jî stûnên vala hene, ew jî diyar dike ku hin nivîs hatine sansurkirin.

Sansur, yek ji zextên desthilatdariya siyasî bû û hemû weşan û rojnameyên muxalif ên wê demê hatine sansurkirin, lêbelê weşanên wek *Serbestî* û wd. jî bi taybetî hatine sansurkirin.

### 4.2. Nivîsa Edîtoryal û Armanca Weşanê

Di her hejmarekê *Serbestî* de nivîsa sereke ya edîtoryal heye ku bi giranî nêrînên rojnameyê pêşkêş dike. Di hejmara 1ê de nivîsa edîtoryal bi navê "*Meslek*" hatiye nivîsandin û heman nivîs di hejmara 1., 2., û 3. de jî hatiye belavkirin û di naveroka wê de dibêje:

> *Serbestî*, dê namûs û heysiyetê wek sertaca meslekê bibîne.... *Serbestî*, wê tenê heqîqetê bîne ziman û li rêya çareseriyên medenîbûna milet bifikire.
> Xulesa *Serbestî*; bi awayekî giştî, bêyî ku cudatiya dîn û unsûran bixe navbera wan, dê bibe parastvan û tercumanê fikrên welatiyên zulmdîtî. Ev e, mesleka wê." (Serbestî, 1908: h. 3)

> Piştî ku weşana *Serbestî* dest pê dike, di nav demeke kurt de zextên desthilatdarî jî pê re tên; doz û cezayên ji bo Mewlanzade Rifat peyderpey têne birrîn. Ji nûçeyek hejmara 3yan diyar dibe ku ji xwediyê *Serbestî* re doz hatiye vekirin û ceza li wî hatiye birrîn. "Xiyaben ji Mewlanzade Rifat Beg ê midurê rojnameya *Serbestî* re 3 meh cezayê hepiskirinê hatiye birrîn." (Tunaya, 2010: r. 180)

### 4.3. Xebata Rojnamevanî û Siyasî ya Muxalif; Kuştina Sernivîskarê *Serbestiy*ê

Piştî ku *Serbestî* dest bi weşanê dike, di demeke kin de bi xeta xwe ya serbixwe, di nav xelkê de komek pêgirên wê çêdibin û her roj tîraja wê zêdetir dibe. Mewlanzade Rifat di vê hengameyê de qîma xwe tenê bi rojnamevaniyê naîne, dixwaze tevlî siyasetê jî bibe.

Di wê pêvajoyê de li ser esasê parastina fikra "Adem-î Merkezî", Partiya Ehrara Osmanî hatibû danîn. Ev partî, yekem partiya muxalif bû li hemberî desthilatdariya Îttihad û Tereqqiyê. Prens Sebahedîn serokê manewî yê partiyê bû. Piştî ku Partiya Ehrar tê damezirandin, ji ber parastina fikra wê ya "Adem-î Merkezî", Mewlanzade Rifat û hevalên wî jî xwe nêzîkê vê partiyê dikin. Bi vî awayî Mewlanzade Rifat, qîma xwe tenê bi rojnamevaniyê neaniye, ji aliyê siyasî ve jî piştgiriya Partiya Ehrarê dike, lêbelê ne endamê wê ye. Mewlanzade Rifat di bîranînên xwe de dibêje: "Ji alîkî ve em ne endamê Partiya Ehrar a Prens Sebaheddîn bûn, lê me piştgirî dida wê, ji aliyê din ve jî em dixebitîn ku partiyeke siyasî ya nû damezirînin." (Rifat, 2009: 29) Li gor dîtina T. Z. Tunaya, wê demê "*Serbestî* adeta wek rojnameya Partiya Ehrar" (Tunaya (b. I), 2010: 180) kar kiriye.


Mewlanzade Rifat û rojnameya *Serbestî*, li hemberî desthilatdariya Îttihad û Tereqqî, bi tevî grûb û rêxistinên muxalifên nêzîkê hev, muxalefet û têkoşîneke dijwar kirine. Ji ber vê yekê, zext û zordestiya li ser muxalefetê her ku diçû girantir dibû; her rojê ku derbas dibû cînayetên siyasî zêdetir dibûn. Di vê pêla terora desthilatdariya Îttihad û Tereqqiyê de, gelek caran rasterast yan jî bi rêya sîxuran,

Mewlanzade Rifat û *Serbestî* jî hatibûn tehdîtkirin û gef li wî hatibû xwarin. Piştî van tehdît û gefxwarinan, roja 6ê Nîsana 1909ê, Hesen Fehmî yê sernivîskarê *Serbestiy*ê li ser pira Galatayê hate kuştin.

**4.4. Bûyera 31ê Adarê û Mewlanzade Rifat**

Li ser kuştina Hesen Fehmî hefteyek derbas bû, di 13yê Nîsana 1909an de bûyerên bi navê "*Waqi'aya 31ê Adarê*" rû da. Ji ber têkiliyên wî û Partiya Ehrar û serokê wê yê fexrî Prens Sebaheddîn, Mewlanzade Rifat ne tam di nav vê bûyerê de ye û ne jî li derveyê wê bû. Ew di destpêkê de, vê bûyerê wek hewldaneke xelasbûna ji rejîma îstibdad û desthilatdariya Îttihad û Tereqqiyê dibîne, di vê çarçoveyê de xwe nêzîkî wan dike, tevlî hin vexwendin û civînên wan dibe. Mewlanzade Rifat di dema pêşketin û geşbûna bûyeran de, rêvebirên vê hewldanê baş nas dike û dibîne ku planek, rêxistinek û cesaretekî ciddî yê aktorên vê bûyerê nîne. Û pê bawer dibe ku rêvebirên Ehrarê nikarin bibin rêber û serokê şoreşekê. Bi gotina Mewlanzade Rifat: "Ev serhildan, trajediyeke mezin bû. Bi lutfa Xwedê bê zerareke mezin derbas bû. Ev bûyera mezin, di çarçoveya xeyalên armanceke mezin de, ji aliyê Presn Sebaheddîn Begê kurê Damat Mehmûd Paşa ve hatiye sazkirin û amadekirin. Hedefa wê ya yekem, jitextdaxistina Sultan Ebdulhemîd û têkbirina desthilatdariya Îttihad û Tereqqî bû. Heta wê gavê, me ev partî wek grûbeke siyasî qebûl dikir û ji ber vê, piştgiriya wê dikir. Lê bûyerên pêkhatî pirr bi zelalî dan diyarkirin; ew unsûrê ku partiyeke siyasî bi rê ve bibe û bilind bike, ne bernameya wan a fewqelade û bêqusûr e, ne jî qabîliyet û biryardariya rêvebirên wê ye." (Rifat, 2010: 112)

Mewlanzade Rifat, li ser Bûyera 31ê Adarê, van rexneyan li grûba Prens Sebaheddîn digire û her wiha kirinên desthilatdariya Cemiyeta Îttihad û Tereqqîyê jî bi zimanekî dijwar rexne dike û dibêje: "Di welatê me de bi tevî îlankirina hurriyetê, hinek zorbe peyda bûn û ew serserî bi navê "Îttihad û Tereqqî" museletî xelkê bûn. Xwestin di bin tehakuma xwe de milet biçewsînin û bi xogiyê ve girê bidin. Wekî hovan êrîşî kesên xwedî heysiyet û namûs kirin. Bûne parastvan û penageha diz û nemerdan. Xwestin bi qedera milet bileyzin û desthilatdariya Osmanî di destê xwe de bikin wek pêlîstokekê. Ji bo menfaetên xwe yên kirêt, gelek cînayet û xerabî kirin. Carinan tecawizî mafê


SERBESTI CONSTANTINOPLE

*Serbestî*, h. 142

şexsekî û carinan jî yê cemiyetekê kirin, ji wê jî bêtir bi giştî tecawizê unsûrekî Osmanî; muqedesat û nirxên wan ên pîroz kirin. Eger xelkê reben nikarî tehammul bi vê yekê bike û serî hilda, wê gavê jî wek "Murtecî" hatin binavkirin. Bi top û tifingên xwe çûn bi ser wan de; ew kuştin, ser jê kirin, xeniqandin û nefî kirin." (Serbestî, 1918: h. 172)

Ji têkbirina "Bûyera 31ê Adarê" şûn ve, desthilatdariya Îttihad û Tereqqî, tenê bi pêkanîna teror û zordestiya siyasî namîne, ji aliyê îdeolojîk ve jî di nav rêxistinê de guhertin çêdibin; ji xeta "Osmanîparêzî"yê bêtir, ber bi "Tûranperestî-Tirkperestî"yê ve diçe. Ji alîkî ve desthilatdariyeke wekî rejîma îstibdadê pêk tîne û ji aliyê din ve jî siyaseta netewî-etnîkî derdixe pêş. Ji ber vê rewşa nû, gelek rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd ên ku berê li ser esasên "Osmanîparêzî"yê di nav tevgera Îttihad û Tereqqîyê de cî girtibûn, ji wan vediqetin û hinekê wan rêxistinên xwe çêdikin û hinek jî di nav rêxistinên muxalif de xebata xwe didomînin.

Mewlanzade Rifat, ji ber Bûyera 31 Adarê, dîsa rastî êrîşên desthilatdariya Îttihad û Tereqqîyê tê; ji aliyê Dîwana Herb-î Urfî ve bi egera têkiliya wî ya bi vê bûyerê re, 10 sal cezayê nefîkirinê li wî tê birrîn, careke din ji bêgaviyê berê xwe dide welatên biyanî.

## 5. QONAXA DUYEM A ROJNAMEYA *SERBESTÎ*: ÇAPA LI PARÎS Û MISRÊ

Di vê xebatê de, ew dema ku bi navê serdema duyem tê binavkirin, ji biryara nefîkirina Dîwana Herb-î Urfî ya 21yê Nîsana 1909ê dest pê dike û hetanî rawestandina weşana *Serbestî* ya ber bi dawiya sala 1912yê dewam dike.

Mewlanzade Rifat, hefteyek ji pêkhatina Bûyera 31ê Adarê şûn ve, mecbûr dimîne careke din Stenbolê terk bike. Di 21ê Nîsana 1909ê de berê xwe dide Misrê û piştî rêwîtiya 5 rojan digihîje Qahîreyê. Li Misrê nexweş dikeve û ji ber nexweşiya xwe derbasî Atînayê dibe. Dema ku ew li Atînayê bû, Dîwana Herbê Urfî ya Stenbolê, biryara destgîrkirina wî derdixe û îlan dike.

Mewlanzade Rifat, demeke kin şûnde, ji Atînayê diçe Parîsê. Li Parîsê serdana Şerîf Paşa dike. Şerîf Paşa bixwe jî muxalifekî meşhûr ê wê demê bû û "sala 1909ê li Parîsê bi navê Partiya Osmanî ya Islaheta Esasî" (Rifat, 2010: 28) partiyek damezirandibû. Mewlanzade Rifat li wê derê dibe endamê vê partiyê û li ser ji nû ve neşirkirina *Serbestî*, ew û Şerîf Paşa, di 27ê Temûza 1909ê de peymaneke dualî ya li ser 12 bendan çêdikin. Naveroka peymanê, li ser temînkirina mesref û polîtîka rojnameya *Serbestî* bû.

Ji îmzekirina peymanê şûn ve *Serbestî*, li Parîsê bi heftane tê weşandin û li ser hev 13 hejmarên *Serbestî* li Parîsê têne çapkirin û paşê ji ber hin nakokiyên navbera aliyan, Şerîf Paşa piştgiriya ji bo çapkirina *Serbestî* qut dike û ji ber vê yekê çapkirina rojnameyê tê rawestandin.

Piştî rawestandina weşana *Serbestî,* Mewlanzade Rifat dîsa berê xwe dide Misrê. Li Misrê ji nû ve hewl dide ku neşriyata rojnameya *Serbestî* bidomîne û hetanî Sibata 1910an, 7 hejmarên din li vê derê çap dike û neşriyata rojnameyê tê rawestandin. Paşê bi têkiliya hin dostên xwe hevdîtinekê bi Xidîwê Misrê re pêk tîne, di encama vê hevdîtinê de miqdarek alîkariya maddî ji wan digre û dîsa ji bo çapkirina rojnameyê berê xwe dide Parîsê. Vê carê jî 4 hejmarên *Serbestî* li Parîsê çap dike. Ji çapkirina 4 hejmaran şûn ve, piştgiriya maddî qut dibe û ji bêgaviyê cardin vedigere Misrê. (Şerif Paşa, 1990: 89)

Mewlanzade Rifat bi tevî hemû bargiranî û zehmetiyên nefîkirinê, ji prensîbên xwe yên bingehîn tawîzan nade û bi xwe jî dibêje: “Me hemû jiyana xwe bi azadî derbas kir. Me azadiya xwe, baweriya xwe û wijdana xwe nekir malzemeyên yekî.” (Rifat, 2009: 89)

Mewlanzade Rifat sala 1911yê çûye Atînayê û li wê derê bi piştgiriya Rûmên kevnewelatiyên Osmanî rojnameyên *Farûq* (3 hejmar) û *Cîhad* (11 hejmar) neşir kirine. (Birinci, 2001: 383) Lêbelê nêrînên wan û hikûmeta Yûnanî ne li hev in. Ji ber vê yekê, her roja ku derbas dibe zextên hikûmetê li ser wan zêde dibin. Mewlanzade Rifat dibêje: “Me dît ku rewş xerab e; me biryar da ku vegerin welat û teslîm bibin.” (Rifat, 2009: 90)

Dema tê Stenbolê, bi biryara Dîwana Herb-î Urfî cezaya îqameta mecbûrî digire û wî rêdikin bajarê Bursayê. Ji demekê şûn ve, guhertineke îdarê çêdibe, Îttihad û Tereqqî ji hikûmetê vedikişe û bi serokatiya Ahmed Muxtar Paşa hikûmeteke nû tê danîn û efûyek tê derxistin, ew jî dikeve ber vê efûyê û ji Bursayê vedigere Stenbolê.

Ji bo çapkirina *Serbestî* serdana Wezareta Daxilî dike, lê wezaret destûra weşandina rojnameyê nade. Paşê hin guhertinên qanûnî çêdibin û di encama wê de, roja 29ê Temmûza 1912yê dîsa li Stenbolê neşirkirina *Serbestî* dest pê dike. Mixabin zêde dirêj najo û di 1ê Îlona 1912 de bi biryareke siyasî, neşirkirina rojnameyê tê rawestandin. (Birinci, 2001: 383)

Piştî rawestandina weşana *Serbestî,* sala 1913yê hem di jiyana wî ya şexsî û hem jî ya fikrî de guhertinên girîng çêdibin. Mewlanzade Rifat, sala 1913yê, di 44 saliya xwe de, bi Nûriye Ulwiye Xanim re dizewice.

Nûriye Ulwiye Xanim, jineke aktîvîst a wê demê bû û bi navê “Cemiyeta Mudafa-î Huqûq-î Nîswan” [Komeleya Parastina Mafê Jinan-KPMJ] rêxistinek qanûnî bi tevlî hevalên xwe damezirandibûn û li ser navê vê cemiyetê kovara “*Kadınlar Dünyası*” *[Cîhana Jinan-CJ]* derdixist.

Nûriye Ulwiye Xanim li ser fikriyata derxistina kovareke wisa dibêje: “Fikra derxistina kovareke wisa, ji aliyê Mewlanzade Rifat ve hate pêşniyarkirin û ji hejmara 163yan şûn ve jî ew bixwe bû berpirsyarê kovarê.” (Mojab, 2005: 86)

## 6. ŞÛRÊ DÎWANA HERB-Î URFÎ LI SER *SERBESTIY*Ê

Di dema weşan û karkirina rojnameyê de, Dîwana Herb-î Urfî rehetî nedaye *Serbestî* û Mewlanzade Rifat; ji ber nivîsên wî û sernivîsên rojnameyê, ew gelek caran mehkeme kirine, ceza dane û carinan jî mehkemeyên wî, bi biryara beraetkirinê bi dawî bûne. Mewlanzade Rifat, di hejmara 211an ya *Serbestî* de, polîtîkaya hikûmetê û helwesta Dîwana Herb-î Urfî rexne dike û dibêje: "Kes nikare bi darê zorê destekê bide hikûmeteke wisa ku zulm û zordestiya wê li cîhanê belav bûye. Ji ber vê, divê Padîşah û mebûs mewcûdiyeta xwe bidin diyarkirin, hikûmeteke nû bînin ser milet ku ew hikûmet mexseda milet ne bi fikir û gotinan, di pratîkê de pêk bîne.

Îro mutefekirên milet, hurriyeta axaftinê, hurriyeta kombûnê û hurriyeta çapemeniyê dixwazin. Hikûmetek pêdivî ye ku sikûnet û asayişê pêk bihêne, vê rewşa xirab bi dawî bike û tehdîdên navxweyî têk bibe…

Rizgarkirina heysiyeta me ya millî, wezîfeyeke ferdên bi heysiyet e…" (Serbestî, 1919: h. 211)

Dozger piştî ku vê beşa nivîsa Mewlanzade Rifat dixwîne û dibêje, nivîseke wî ya din jî heye ku di heqê wê de jî mehkeme hatiye vekirin û dixwazim van her du dosyeyan bigihînim hev. Ew nivîsa ku bûye mijara mehkemekirina wî, di 10ê Kanûna Ewil de hatiye neşirkirin û naveroka wê jî wisa ye: "Rewşa me ya navxweyî: Li Stenbolê jiyana aborî ya memûran û qata navîn, bûye wek afet û musîbetekê. Tu emlak, alav û keresteyê xelkê û memûran nemaye ku di bazaran de bifiroşin û bixin rehîna tefeciyan.

Hikûmet ev e; ku probleman çareser bike, musîbet û felaketan bide derbaskirin. Dema ku birçîtî, bihayî, bela û musîbet dewam bikin, bi çi awayê hebûna hikûmetê tê tesewirkirin." (Serbestî, 1919: h. 211)

Piştî xwendina xulesaya van nivîsên Mewlanzade Rifat, di berdewamiya wê de îddiayên serokê mehkemê û biryara wê hatiye nivîsandin. Di vê biryarê de dozger Sabrî Beg dibêje: "Nivîsên ku di nav rûpelên *Serbestî* de bi navê *"Bugünkü Vazifeler" [Wezîfeyên îro]* (Serbestî, 1918: h. 185) û ya ku di hejmara 11yê Kanûna Ewil de bi navê "*Ümidimiz boşa çıkmasın, biraz nur*" *[Bila hêviya me betal nebe, hinek ronahî]* hatine belavkirin, emniyeta siyasî ya dewletê û daxiliyeya wê nexistiye xeterê, ji ber vê yekê heyeta mehkemeyê biryara beraetkirina Mewlanzade Rifat dide." (Serbestî, 1919: h. 211)

## 7. GUHERÎNA FIKRÎ Û SIYASÎ: JI XETA "ÎTTIHAD-Î OSMANÎ" Û "ADEM-Î MERKEZÎ"YÊ, BER BI PARASTINA SERXWEBÛNA KURDISTANÊ VE

Di sala 1913yê de, di jiyana wî ya fikrî û siyasî de guherînên girîng çêdibin. Wekî fikriyateke giştî ya gelek rêxistin û rewşenbîrên Kurdên wê demê, Mewlanzade Rifat jî di destpêkê de çareseriya meseleya qewmî-neteweyî, di çarçoveya fikra "Îttihad-î Osmanî" de, bi pêşxistina reforman û naskirina mafê kulturî yê miletên di nav sînorên împaratoriyê de dinirxand.

Ji nîvê sala 1913yan şûn ve, êdî "rejîma dewletê di çarçoveya bernameya Cemiyeta Îttihad û Tereqqî de, siyaseteke tundrew a Tirkparêziyê dimeşand. Armanca sereke û yekane ya Cemiyeta Îttihad û Tereqqî ev bû; bi awayekî mutlaq Tirkkirin û yan jî ji binî ve tesfiyekirina unsûrên din bû." (Dêrsimî, 1997: 31)

Mewlanzade Rifat jî di vê demajoyê de wekî gelek siyasetmedar û têkoşerên muxalif, êdî îqna bûye ku ji xeyrî rêxistinbûna miletê Kurd û serxwebûna Kurdistanê rê li ber wan nîne.

Di van salan de, fikra neteweyî roj bi roj di nav civata Kurd de geş dibû. Di sala 1908an de Cemiyeta Teawûn û Tereqqî ya Kurdan hatibû damezirandin û bi wê ve girêdayî *Rojnameya Teawûn û Tereqqî ya Kurd* (RTTK) dest bi weşanê kiribû. Di sala 1912 de *Cemiyeta Hêvî ya Xwendekarên Kurd* (CHXK) hatibû damezirandin û ciwanên neteweyî yên Kurd peyderpey li dorûberê vê cemiyetê berhev dibûn û li ser navê cemiyetê weşanên nû dihatin belavkirin. Di xebata civakî û siyasî ya Komela Hêvî, kovarên *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* de, her ku diçû fikr û daxwazên neteweyî bêtir derdiketin pêş. Jixwe beriya wê jî, têkiliya Mewlanzade Rifat bi van rêxistin û kovaran re hebû.

Mewlanzade Rifat, di rewşeke wisa de berê xwe ji fikra "Îttihada Osmanî" ber bi daxwazên neteweyî yên Kurd ve dide. Ji vê demê şûn ve, meyla wî ya li ser meseleya Kurdistanê, têkiliya wî ya bi rêxistin û weşanên Kurd re, kûrtir û berfirehtir dibe. Ev dem û dewreya nû, bi nameya wî ya ji bo kovara *Hetawî Kurd* dest pê dike. Ew di nameya xwe ya ji bo rêvebirên *Hetawî Kurd* de, ji alîkî ve bersiva Ebdullah Cewdet jî dide û dibêje: "Niha wezîfeya me ev e, divê bîzatîhî em Kurd bixwe li çareseriya mesela xwe bigerin. Ew ên ku li pey îdealeke millî baz nedin, miletê xwe nas nekin, bê ruh in û di nav koma beşer de pirr bi paş ve mane. Bêruhbûna miletekî tesewir bikin, mirov çi qas diêşîne." (Rifat, 1329: Hetavî Kurd, h. 2) Em dibînin ku hemû miletan ji bo bilindbûn û pêşketinê, ji xwe re helqeyeke neteweyî diyar kirine. Eger armanceke zelal û diyar li meydanê tunebe, rêkirina ciwanên Kurdan ji bo Anatoliyayê bêfeyde ye… Divê em beriya her tiştî armancên xwe diyar bikin, zûtirîn dem bi metanet amadekariya xwe bikin û paşê biçin Kurdistanê." (Rifat, 1913: Hetavî Kurd, h. 2)

Ebdullah Cewdet jî di çaçoveya van munaqeşeyan de, li ser pirsgirêka neteweyî nêrîna xwe wiha tîne ziman û dibêje: "Serdema me, serdema netewetiyê ye. Hikûmet û dewletên otorîter ên herî radîkal jî nikarîn pêşiya vê cereyanê bigirin û dê nikaribin jî." (Cewdet, Rojî Kurd (2002): 52)

## 8. QONAXA SÊYEM A ROJNAMEYA *SERBESTÎ* Û MEWLANZADE RIFAT

Di vê dewreyê de M. Rifat, hem rojnamevan û hem jî siyasetmedarekî çalak e; wî rasterast di navenda siyasetê de cî girtiye, yek ji damezrîner û serkirdeyê herî

girîng ê tevgera Kurd e û karê çapemeniyê jî li ser navê tevgera neteweyî ya Kurd dimeşîne. Ew, digel Emîn Alî Bedirxan, yekem partiya siyasî ya bi navê Partiya Gel a Radîkal damezirandine û paşê jî bi tevî hevalên xwe beşdarî Komela Pêşxistina Kurdistanê bûne û bi xwe jî dibe endamekî navendî yê KPKê.

**8.1. Mewlanzade Rifat û Partiya Awam a Radîkal**

Piştî Şerê Yekem û îmzekirina Peymana Mondrosê, meydana siyasetê geş û gurr dibe, Kurd jî di vê sehayê de rasterast bi rêxistinên xwe cî digrin. Lêbelê xwe ji zemîna siyaseta giştî ya wê demê jî dûr naxin û têkiliyên xwe bi grûbên muxalif ên din re jî qut nakin.

Ji îmzekirina Peymana Mondrosê şûn ve ji aliyê dîroka damezirandinê ve partiya ku pêşiyê tê avakirin, Firqaya Awam a Radîkal [Partiya Gel a Radîkal] e. Partiya Gel a Radîkal (PGR), di roja 22 Teşrîna Ewil a 1334ê [22yê Kewçêra 1918] de hatiye damezirandin û serokê wê jî Mewlanzade Rifat e. Li gorî agahdarî û nivîsandina Tarık Zafer Tunaya, di nav lîsteya damezrîner û rêvebirên wê de navê van şexsiyetan derbas dibe: "Mewlanzade Rifat Beg (reîs), Emîn Alî Beg (ji Mifetîşiya Maliyeya Edirneyê malnişîn e), Mazlûm Beg (rojnamevan), Mehmed Faîq Beg (ticar), Ragip Beg (xwediyê rojnameya *Mudafaa*), Babanzade Ezîz Beg. (Tunaya (b. II), 2010: 105)

Di beyannameya partiyê de dibêje: "Em bixwe, terefdarê guhartina hemû usûl û mewzûata hazir in. Ev jî, di destpêkê de ancax bi qebûlkirina projeya teşkîlateke medenî, hevdem û muntezem mumkin dibe. Heta ku em fihrista teşkîlateke wisa bingehîn, berfireh, medenî û hevdem dernexin meydanê û hîmên wê durist nekin, ji aliyê îdarî û hukmî ve nekevin ser rêyeke medenî û hevdem; dev ji zîhniyeta xwe ya nexweş, zerardar û kevneşopî bernedin, bêguman em nikarin doza mafê diyarkirina dahatûya xwe bi meqamên Ewrupayî bidin guhdarkirin." (Serbestî, 1918: h. 176)

Li ser navê Partiya Gel a Radîkal, di 26ê Çiriya Pêşîn a 1918an de dest bi neşirkirina rojnameya *İnqilab-i Beşer [Soreşa Mirovahiyê]* kiriye" (Rifat, 2000: 319) Di nav rûpelên vê rojnameyê de bi hemû hêz û karînê, ev xusûsiyet hatine parastin: "Divê meqamê Şêxul-Îslamî ji mueseseya dewletê bê derxistin û wek mueseseyeke xeyrî resmî ya Îslamî bê îdarekirin; îdareya weqfan dewrî cemaatan bibe; ji bo jinan mafê hilbijartinê bê qebûlkirin; medrese bêne guherîn û bibin mekteb, îdareya wan jî bi tevlî weqf û dahatûyan ve dewrî Wezareta Mearîfê bibe; her wiha divê tekke dewrî şaredariyê bibin, dahatûya wan û weqfên bi wan ve girêdayî, ji bo avakirina museseyên wekî Sêwîxane û Darul-Aceze bêne xerckirin." (Rifat, 2000: 320)

Partiya Gel a Radîkal di beyannameya xwe de parastina pêkhatina reformên hevdem dike û dibêje: "Divê Qanûna Esasî ji nû ve bête tenzîmkirin; hilbijartina mebûsan li ser sîstema adedî nisbî bête duristkirin; usûla îdareya mehelî û qanûna memûran ji nû ve bête tertîbkirin; otorîterîzm û bandora leşkerî bête rakirin; di çarçoveya pêşxistina çandiniyê de zîraet bête îslahkirin; bi teşwîq û rênîşandanê sinayî

bête îhyakirin; maliye li gorî zîhniyeta esra nû bête sazkirin; ji bo pêşxistina perwerdeyê, divê hejmara mekteb û medreseyan bête zêdekirin û yekrêziya wan bête pêkanîn." (Serbestî, 1918: h. 176)



Mewlanzade Rifat di ofîsa xwe ya xebatê de

Di navbera dema damezirandina Partiya Gel a Radîkal (PGR) û Komeleya Pêşxistina Kurdistanê (KPK) de demek pirr kurt heye; PRG, di roja 22 Teşrîna Ewil a 1334ê [22/10/1918] de hatiye damezirandin û KPKê jî di 17yê Kanûna Ewil a 1918yê de hatiye damezirandin. Em hîn bi zelalî nizanin di navbera vê partî û Komela Pêşxistina Kurdistanê de çi têkiliya organîk hebûye, ew ne diyar e. Mewlanzade Rifat, "Endamê merkeza umûmî ya Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê bû." (Rifat, 2000: r. 270) Damezrînerekî herî girîng ê vê partiyê jî Emîn Alî Bedirxan e. Emîn Alî Bedirxan, di KPKê de jî cîgirê serok ê yekem e. Tenê statuya van her du damezrîneran, ji bo têkiliya KPK û Partiya Gel a Radîkal diyardeyeke berbiçav e. Dîrokzan T. Z. Tunaya di derbarê siyaset û helwesta partiyê de dibêje "Damezrînerê wê Mewlanzade Rifat, muxalifekî dijwar ê Îttihad û Tereqqîyê bû û di nav grûba Şerîf Paşa de jî cî girtibû. Ev, di nav siyaseta wê demê de cebhe û ciyê partiyê jî diyar dike." (Tunaya (b. II), 2010: 105-106) T. Z. Tunaya, di pirtûka xwe ya navborî de dibêje li gor agahdariyên hejmara 170. a rojnameya *Alemdar*, ev partî û Partiya Demokrat bûne yek.

Bi îhtimaleke pirr mezin, ev partiya ku bi navê "Partiya Demokrat" hatiye binavkirin, di eslê xwe de "Partiya Demokrat a Kurd" e. Em hebûna partiyeke wisa, ji raporteke bi hejmara "FO371/4192" ê roja 30ê Îlona 1919 yê Komîseriya Bilind a Birîtanyayê fêr dibin. (Mesut, 1992: 97)

**8.2. Cemiyeta Tealiya Kurdistanê [Komeleya Pêşxistina Kurdistanê (KPK)]**

Li ser roja damezirandina **KPK**ê, tarîxên cihê têne diyarkirin. Tunaya, li gor nivîseke Wezareta Navxweyî, dibêje ev komel di roja 17yê Kanûna Ewil a 1334ê [30yê

Kanûna 1918] (Tunaya (b. II), 2010: 198) de hatiye damezirandin. Di rêziknameya navxweyî ya Komelê de jî tarîxa 6 Teşrîna Sanî 1334 hatiye nîşandan [19 Kanûna 1918]. Di maddeya yekem a nîzamnameyê de armanca cemiyetê wiha hatiye nivîsandin: "Ji bo temînkirin, parastin û pêşxistina berjewendiyên giştî yên Kurdan, rêxistineke bi navê "Komela Pêşxistina Kurdistanê" (Tunaya (b. II), 2010: 215) hatiye damezirandin. Qedrî Cemîl Paşa jî endamê vê rêxistinê bû û di bîranînên xwe de dibêje: "Di dawiya Şerê Giştî de welatperwerên Kurd yên li Stenbolê ji bo serxwebûna neteweya Kurdistanê bi navê Komela Pêşxistina Kurdistanê komeleyeke siyasî damezirandin." (Silopî, 2007: 51)

Her çiqas di armanc û daxwazên siyasî de yekrêziyek tunebe jî, di daxuyanî û têkiliyên dîplomatîk de rêvebirên **KPK**ê, ji bo miletê Kurd, mafê diyarkirina çarenûsiyê diparêzin û dixwazin "Prensîbên Wilson" ji bo çareseriya meseleya miletê Kurd jî bête tetbîqkirin. Ev daxwaz, ji aliyê Şerîf Paşayê nûnerê Kurd ve, ji bo Konferansa Aşitî ya Parîsê jî tê pêşkêşkirin û dibêje: "Li gor Prensîbên Wilson, mafê Kurdan heye ku dewleteke azad û serbixwe damezirînin." (Şimşir, 2009: 305)

Li gor raporteke Wezareta Derve ya Brîtanyayê ku hejmar (FO371/4191) e û di 17yê Hezîrana 1919yê de hatiye rêkirin: "Navenda KPKê li Stenbolê ye û li Diyarbekir, Dêrsim, Sêrt, Xarpêt û Meletiyê jî buroyên wan hene. "*Serbestî*", propagandaya KPKê dike. Tenê li Stenbolê hejmara endamên vê rêxistinê nêzîkî deh hezar in." (Mesut, 1992: r. 41)

Di raporta navborî de, navê serok û endamên navdar ên KPKê, wekî li jêrê hatine diyarkirin:

Serok: Seyid Ebdulqadir

Endam û damezrêrên wê yên berçav ev in:

Mistafa Zîhnî Bedirxan, Emîn Alî Bedirxan Beg, Seyid Mehmed Efendî, Seyid Ebdullah Efendî, Mehmed Alî Bedirxan Beg, Seîdê Kurdî, Xelîlê Xeyalî, Hemzeyê Muksî, Bînbaşî Emîn Beg, Bînbaşî Silêman Nûrî Beg, Dr. Mehmed Şukrî Beg, Hecî Alî Riza Efendî, Alî Îhsan Beg, Alî Heyder Beg, Ahmed Arîf Efendî, Mihemed Nûrî Efendî, General Hemdî Paşa, General Mistefa Paşa, Mewlanzade Rifat Beg. (Mesut, 1992: 41-42)

### 8.3. *Serbestî* Wek Weşana Rojane ya KPKê Kar Dike

Wekî ku li jorê jî hate gotin, Mewlanzade Rifat, endamekî aktîf û navendî yê Komela Pêşxistina Kurdistanê bû. Herweha *Serbestî* jî, piştî Şerê Giştî, gihiştiye dewre û statuyeke nû. Ji vê demê şûn ve *Serbestî*, wek neşriyateke **KPKê** tê nasandin. Ebdurrehîm Rehmîyê Hekarî di nivîsa xwe ya bi navê "*Kurd û Kurdistan*" de, li ser vê têkiliyê wiha dibêje: "Rojnameya *Serbestî, Jîn* û *Kurdistan* ji bo parastina huqûqa me ya millî hatine texsîskirin. Divê mutleqe li her ciyê Kurdistanê bi berdewamî

bêne belavkirin, temînkirin û bi dîqet bêne mutaleekirin… Û ji bo ku abonetiya van rojnameyan bêtir bibe, divê ehemiyeteke zêde bête nîşandan û bihayê abonetiya rojnameya rojane ya *Serbestî* û kovarên heftane yên *Jîn* û *Kurdistan* rasterast ji bo navenda cemiyeta me bêne şandin.” (Serbestî, 1919: h. 483)



*Serbestî*, h. 483, 2 Mayis 1919

Suleyman Tevfîkê îdarekarê rojnameya *Turkçe Îstanbul*ê jî li ser vî dewra *Serbestî* dibêje: “Bi tevî pêkhatina mutarekeyê Mewlanzade dest bi weşandina rojnameya *Serbestî* kir. *Serbestî*, fikrên Cemiyeta Tealiya Kurd belav dikir.” (Tevfik, 2011: 513-514)

Ji van agahdariyan diyar dibe ku *Serbestî,* di vê dewreyê de wek weşaneke rojane ya KPKê hatiye neşirkirin.

**8.4. Hinek Meqale û Nivîsên di Nav Rûpelên *Serbestî* de**

Di nav rêza nivîskarên *Serbestî* de, navê kesayetiyên wekî Mewlanzade Rifat, Kamuran Bedirxan, Celadet Bedirxan, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, Bedîuzzeman Seîdê Kurdî, Tewfîqê Silêmanî, M. A., Xelîlê Siwêrekî, Îbrahîm Memdûh, Îbrahîm Merdux, Zuhdîzade Ahmed Huseyn, N. N. û wd. hene. Her wiha hin navên mexles ên wekî “Qabaqulaq” û “Ferîde” jî hatine bikaranîn. Bi taybetî di serdema sêyem de, di nav rûpelên *Serbestî* de gelek nûçe û nivîsên li ser Kurd û Kurdistanê hatine çapkirin.

Ji xeynî hinek hevok û rêzikan, zimanê nivîsên rojnameya *Serbestî*, bi giştî Tirkî ye. Lêbelê ev nayê vê wateyê ku bi Kurdî nivîsandin ne armanc û tercîha redaksiyona rojnameyê bû. Ji ber qedexe û sansura li ser zimanê Kurdî, nekarîne bi Kurdî binivîsînin. Sansur, wê demê jî babeteke girîng a çapemeniyê bû û bi taybetî jî nivîsên Kurdî dihatin sansurkirin. Dema em bala xwe bidin hin hejmar û rûpelên *Serbestî*, diyar dibe ku valayî di nav de heye û ew valayî ji ber sansur û qedexeya li ser zimanê Kurdî bû. Li ser meseleya sansurê, di hejmara 29ê Nîsan 1919yê de wiha hatiye gotin: “Ji ber ku di nava îdareya metbûatê de mutercîmekî şarezayê zimanê

miletê Kurd nîne, gelek astengî li pêşiya neşriyata Kurdî çêdibe. Ji ber vê yekê, roja bihurî, helbesteke Kurdî ji nav rûpelên rojnameya me hatiye sansurkirin." (Serbestî, 1919: h. 480)

Ji ber sansurê, di nav rûpelên *Serbestî* de bi navê "*Neşriyata Kurd*" daxuyaniyek hatiye belavkirin û dibêje: "Ji aliyê îdareya sansurê ve helbesteke Kurdî ji nav rojnameya me hatiye derxistin. Helbest bi tevî tercumeya xwe hatibû nivîsandin û rakirina wê ne li gorî teamulên heyî bû. Gelek rojname 20-30 rêzik û qitayên bi zimanê Fransizî û Farisî çap dikin û rastî tu astengiyekî nayin, em hêvî dikin ev qaîde ji bo neşriyata me jî bêne tetbîqkirin." (Serbestî, 1919: h. 480)

Ji ber ku hemû hejmarên *Serbestî* li ber destê me nînin, li gorî lêgerêna me ya li ser hejmarên berdest, li ser navê Kurd û Kurdistanê hin nivîsên girîng ên li jêrê di nav rûpelên *Serbestî* de hatine neşirkirin.

Birrek ji wan nivîs û meqaleyan ev in:

- Diyarbekirli Gewranîzade [Goranîzade]: M. Memdûh, *Feryadı mazlumin [Mazlumların feryadı]* (Serbestî, 1324 (1908): h. 3)
- Kamuran Bedirxan, *Kürdler hakkında [Der heqê Kurdan de]* (Serbestî, 1918: h. 181)
- *Serbestî, Bugünkü vazifeler [Wezîfeyên îroyînê]* (Serbestî, 1918: h. 185)
- Kamuran Bedirxan, *Kürdistan-1* (Serbestî, 1918: h. 186)
- Kamuran Bedirxan, *Kürdistan-2* (Serbestî, 1918: h. 188)
- Kamuran Bedirxan, *Kürdistan-3* (Serbestî, 1919: h. 193)
- Kamuran Bedirxan, *Kürdistan-4* (Serbestî, 1919: h. 198)
- Celadet Alî Bedirxan, *Kürdler ve İttihad siyaseti [Kurd û siyaseta Îtîhadê*] (Serbestî, 1919: h. 209)
- *Mewlanzâde Diwan-i Harbe Urfî'de [Mewlanzade di Dîwana Herb-î Urfî de]* (Serbestî, 1919: h. 210)
- *Mewlanzâde Diwan-i Harbe Urfî'de-2 [Mewlanzade di Dîwanê Herb-î Urfî de-2]* (Serbestî, 1919: h. 211)
- Kamuran Bedirxan, *Kurdistan* (Serbestî, 1919: h. 462)
- Kamuran Bedirxan, *Kurdistan hakında selahiyetdar olmayanlar [Ew ên ku di derheqê Kurdistanê de ne selahiyetdar in]* (Serbestî, 1919: h. 470)
- Serbestî, *Kürdler ve Kurdistan: Kürd vatandaşlara [Kurd û Kurdistan: Ji Kurdên welatî re]* (Serbestî, 1919: h. 476)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kurdistan: Kürdistan'da haleti fikriye [Kurd û Kurdistan: Li Kurdistanê rewşa fikrî]* (Serbestî, 1919: h. 477)
- *Serbestî, Kürdler ve Kürdistan: Kürd hemşirelerimiz*

*[Kurd û Kurdistan: Hemşîreyên me yên Kurd]* (Serbestî, 1919: h. 479)
- *Serbestî*, *Kürdler ve Kürdistan: Bir beyanname münasebetiyle*
*[Kurd û Kurdistan: Bi mûnasebeta beyannameyekê]* (Serbestî, 1919: h. 480)
- *Serbestî, Kürdler ve Kürdistan: Kürd muhacirlerinin vaziyeti*
*[Kurd û Kurdistan: Rewşa mihacirên Kurd]* (Serbestî, 1919: h. 481)
-Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kurdistana Kurd memurler*
*[Kurd û Kurdistan: Memurên Kurd li Kurdistanê]* (Serbestî, 1919: h. 482)
- Ebdurrehîm Rehmiyê Hekarî, *Kürdler ve Kürdistan*
*[Kurd û Kurdistan]* (Serbestî, 1919: h. 483)
- Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistana doğru-2*
*[Kurd û Kurdistan: Ber bi Kurdistanê ve-2]* (Serbestî, 1919: h. 484)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Nazik bir vaziyet karşısında*
*[Kurd û Kurdistan: Li hember weziyeteke nazik]* (Serbestî, 1919: h. 485)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kurd lisani*
*[Kurd û Kurdistan: Zimanê Kurdî]* (Serbestî, 1919: h. 486)
- Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan-3*
*[Kurd û Kurdistan-3]* (Serbestî, 1919: h. 487)
- Cizreli Taceddin Taqî, *Kürd Mektubu*
*[Mektuba Kurd]* (Serbestî, 1919: h. 487)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürtlerin Amali*
*[Kurd û Kurdistan: Emelê Kurdan]* (Serbestî, 1919: h. 488)
- Serbestî, *Kürdistan Teali Cemiyeti Beyannamesi*
*[Beyannameya Cemiyeta Tealiya Kurdistanê]* (Serbestî, 1919: h. 488)
- Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerde İttifaq*
*[Kurd û Kurdistan: Îttifaqa di Kurdan de]* (Serbestî, 1919: h. 489)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistana göz dikenler*
*[Kurd û Kurdistan: Yên çav berdane Kurdistanê]* (Serbestî, 1919: h. 490)
- Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürd edebiyatı- Mem û Zîn-I*
*[Kurd û Kurdistan: Edebiyata Kurdî- Mem û Zîn-I]* (Serbestî, 1919: h. 491)
- Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürd edebiyatı; Mem ve Zîn-2*
*[Kurd û Kurdistan: Edebiyata Kurdî- Mem û Zîn-2]* (Serbestî, 1919: h. 495)
- Sîvereklî Hîlmî, Aziz *Kürdistan*
*[Kurdistana Xoşevîst]* (Serbestî, 1919: h. 492)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan*
*[Kurd û Kurdistan]* (Serbestî, 1919: h. 492)
- *Serbestî, Kürd muhacirlerinin durumu*
*[Rewşa mihacirên Kurd]* (Serbestî, 1919: h. 496)

- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan*
*[Kurd û Kurdistan]* (Serbestî, 1919: h. 497)
- Kamiran Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan*
*[Kurd û Kurdistan]* (Serbestî, 1919: h. 498)
- *Serbestî, Kürd Teali Cemiyeti'nden*
*[Ji Komela Pêşxistina Kurdistanê]* (Serbestî, 1920: h. 595)
- *Serbestî, Mukadderatımız etrafında Türkiye'nin mukadderatı*
*[Muqaderata Tirkiyê ya bi girêdayî muqaderata me ve]* (Serbestî, 1920: h. 596)
- Mevlanzade Rifat, *Hala mı*?
*[Ma hîna jî?]* (Serbestî, 1920: h. 597)
- *Serbestî, San Remo Konferansı*
*[Konferansa San Remo]* (Serbestî, 1920: h. 598)
- Mevlanzade Rifat, *Ümitlenelim mi?*
*[Gelo divê em bi hêvî bin?]* (Serbestî, 1919: h. 600)
- Kenanzade Mustafa Bedretin, *Çeteciler imha edilmelidir*
*[Divê çeteparêz bêne tunekirin]* (Serbestî, 1920: h. 601)

Ji ber ku hemû hejmarên *Serbestî* li ber destê me nînin, agahdariyên ji Gulana 1920an heta dawiya salên 1922an de gelek kêm in. Hejmara dawî ya li ber destê me, jimara 601î e, di 25ê Nîsana 1920an de hatiye çapkirin û li ser bergê wê dibêje "sala 12an".

**8.5. Parçebûna KPKê û Helwesta Mewlanzade Rifat**

Geşbûna bûyeran, pêşketinên li herêm û cîhanê, di nav damezrîner û rêvebirên KPKê de li ser paşeroja Kurdistanê, nêrînên cuda derxistin meydanê. Ji bo dahatûya Kurdistanê, beşekê wan muxtariyet û beşekê din jî serxwebûnê diparastin.

"Piştî parçebûna (jihevbûna) KPKê, Mewlanzade Rifat di nav rêza damezrînerên *Cemiyeta Teşkîlata Îçtîmaiyye* de cî digre." (Silopî, 2007: 61) Li ser dubendiya di nav KPKê de, Seyid Mihemedê kurê Seyid Ebdulqadir dibêje: "Di nav KPKê de, Emîn Alî Bedirxan, Xelîl Rehmî Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Mewlanzade Rifat û Kemal Fewzî "îstiqlalê" diparastin." (Beysanoğlu (b. III), 2001: 951) Mumcu jî dibêje di nav vê grubê de: Şexsiyetên wekî "Emîn Alî Bedirxan Beg, Ferît Bedirxan Beg, Babanzade Şukrî Beg, Babanzade Hîkmet Beg, Dr. Ebdullah Cewdet, Dr. Şukrî Mehmed Beg, Kemal Fewzî yê Bedlîsî, Ekrem Cemîl Paşa, Necmedîn Huseynî yê Kerkûkî, Memdûh Selîm Begî û Mewlanzade Rifat" (Mumcu, 1991: 186) hebûn.

Piştî jihevbûnê, grûbên cihê cihê çêbûn û xebata wan nêzîkî sal û nîvekê berdewam kir, lêbelê nekarîn rêxistinek li gor pêdivî û bersiva demê pêk bînin. Ji ber vê yekê xebatên ji bo yekgirtinê dest pê kirin. Di dawiya xebatên yekgirtinê de "Komîteya Kurd a Stenbolê", "Komîteya Kurd a Erziromê" û Komîteya Îstiqlala

Kurdistanê ya li Misrê, bi tevî hin grûb û rêxistinên din bi navê "Komîteya Îstiqlala Kurdistanê (KÎK)" rêxistineke nû damezirandin. Li gor konsolosê Rûsî Pavlovskî, "Komîteya Kurd a Stenbolê û Komîteya Kurd a Erziromê di Nîsana 1922yê de yekîtiya xwe pêk anîne." (www.Newroz.com, 10ê Sibata 2008)

Di raportek veşartî ya bi hejmara "FO 371/10121" ya Konsolxaneya Îngiliz de, Komîteya Îstiqlala Kurdistanê wek berdewamiya KPKê hatiye destnîşankirin û dibêje; vê rêxistinê, ji ber xweparastin û şupheyên hikûmetê, sala 1921ê qerargeha xwe birine Erziromê û serokê wê jî Mîralay Xalid Beg e. (Mesut, 1992: 143)

## 9. MEWLANZADE RIFAT DI NAV LÎSTEYA 150AN DE

Di sala 1923yê de pêkhatina Peymana Lozanê, rewşeke nû derxistiye holê; di vê peymanê de bendek li ser sirgûnkirina muxalifên tevgera Mistefa Kemal hebû ku TBMMyê li gorî vê bendê, navê Mewlanzade Rifat jî xistiye nav "sirgûnên 150yan." (Hür, 3 Temûz 2011: Taraf )

Ji ber ku navê Mewlanzade Rifat jî ketibû vê lîsteyê, cardin mecbûr ma ku di dawiya sala 1922yan de Stenbolê terk bike. Li gor agahdariyên Ali Birinci, "Ta ku Mewlanzade Rifat ji ber sirgûna 150yan Stenbol terk kiriye, neşirkirina rojnameya *Serbestî* jî dewam kiriye." (Birinci, 2001: 19) Lê mixabin hejmarên wê demê li ber destê me nînin.

Piraniya nefîkiriyên lîsteya 150yan, derbasî welatên dorûberê Tirkiyê bûne, bi taybetî jî derbasî Sûriye û Lubnanê bûne. Lewra "li gorî pêdiviya Peymana Lozanê, rasterast mafê welatîbûna multeciyên li Sûriye û Lûbnanê hebû." (Karay, 2009: 240)

## 10. TÊKILIYA BI TEVGERA 1925AN Û XOYBÛNÊ RE

Ji sala 1920ê şûn ve, pirraniya mesaiya Mewlanzade Rifat bi xebata siyasî, hewldan û têkiliyên dîplomatîk derbas dibe. Mewlanzade Rifat, di dawiya sala 1922yê de Stenbolê terk dike, berê xwe dide Yûnanistanê. Ji wir jî derbasî rojavayê Kurdistanê bûye û li bajarê Helebê bi cî bûye.

Li vê derê bi tevî hevalên xwe "Rêxistina Kurdên Helebê" damezirandine û bixwe jî rêvebiriya vê rêxistinê kiriye. Ew, rasterast tevlî xebat û çalakiyên Tevgera 1925an û xebata Xoybûnê bûye. (Issı (Kürt Tarihi), 2013: h. 8) Ji ber xebatên wî yên siyasî Mewlanzade Rifat, berdewamî ji aliyê îstixbarata Îngilîz û Fransiz ve hatiye şopandin.

Der barê têkiliya Mewlanzade Rifat û Xoybûnê de, lêkolîner Murat Issı dibêje: "Wê demê li ser Mewlanzade Rifat agahdarî û raportên îstixbarî yên rojane hatine amadekirin û li gor van raportan, di pêvajoya damezirandina Xoybûnê de, ji aliyê Mewlanzade Rifat ve wezîfeyên girîng hatine pêkanîn." (Issı (Kürt Tarihi), 2013: h. 8)

Di raporteke Îngilîzî yê bi hejmara C/3551 ê roja 30.08.1928an de lîsteyeke endamên aktîf ên Xoybûnê hatiye çêkirin ku di nav wan de navê kesên wekî: "Mevlanzade Rifat, Alî Îlmî, Memdûh Selîm, Celadet Bedirxan, Haco Axa, Emînê Perîxanê, Mustefa Berazî, Dr. Şukrî Sekban, Cemîl Begê Baban, Xelîl Rehmîyê Bedirxan Beg, Awnî Bedirxan Beg." hene.

Xabat û têkiliyên wan ên siyasî, ne bi dilê dewletên emperyalên Brîtanya û Fransa bû. Di raporteke roja 6ê Sibata 1929ê ya ofîsa Wezareta Derve ya Fransayê de lîsteyek xebatkar û têkoşerên tevgera Kurd û ermenan hatiye rêkirin ji bo departmana kontrolkirina pasaportan û tê de navê têkoşerên neteweparêz ên Kurd wiha hatine rêzkirin:

| **"Navê wan** | **Ciyê wan** |
|---|---|
| Celadet Alî Bedirxan Beg | Îran |
| Memdûh Selîm Cemîl Beg | Heleb |
| Sureya Bedirxan Beg | Qahîre |
| Kamil Bedirxan Beg | Tiflîs |
| Kamuran Bedirxan Beg | Sûriye |
| Emîr Xan Bedirxan | Sûriye |
| Xelîl Ramî Bedirxan Beg | Heleb |
| Awnî Bedirxan Beg | Qahîre |
| Kenan Alî Bedirxan | Heleb |
| Mewlanzade Rifat Beg | Heleb" (Passport Control Department, February 6, 1929, S. 36141) |

Li gorî vê raportê, "evan kesên ku navê wan li jorê hatine nivîsandin, çûyina wan a ji bo nava Iraqê hatiye qedexekirin." (Passport Control Department, February 6, 1929, S. 36141)

## 11. NIVÎS Û PIRTÛKÊN MEWLANZADE RIFAT

Wî di xebata xwe ya nivîskarî û çapemeniyê de xweyîtî û mesûlmiduriya gelek rojname û kovaran kiriye. Her wiha ew nivîskarê wan bû û di van rojname û kovaran de gelek nivîs û meqaleyên wî hatine çapkirin û belavkirin. Ji bo berhevkirin û lêkolîna wan xebateke hîn berfireh divê. Ji xeynî nivîsên wî yên di rojname û kovarên wekî *Huqûqu-i Umûmiye, Înqilab-i Beşer (wek organek PRG), Âkil, Âhalî, Meşrûtiyet, Farûq, Cîhad* (Issı, (Toplumsal Tarih), 2010: h. 196) *û Serbestî, Hetawî Kurd, Jîn* û wd. de ev pirtûkên wî hatine çapkirin:

1- "*Bilanço Yahud Vatan Uğurunda Çektiklerim-1909*
*[Bîlanço yan jî di Rêya Welat de]*.

2-*Yemen Hakkında Dahiliye Nazırı Talat Bey Efendi'ye Açık Mektup-1911*
*[Di derheqê Yemenê de Nameya Aşkera ji Nazirê Daxîlî Talat Begî re].*" (Birinci, 2001: 384)

2- *31 Mart Bir İhtilalin Hikayesi-1911*
*[31 Adarê Çîroka Îhtîlalekê].*

3- *Türkiye İnkılabının İçyüzü-1929*
*[Rûyê Hundirîn ê Şoreşa Tirkiyê].*

4- *Mevlanzâde Rifat'in Anıları [Bîranînên Mewlanzade Rifat].*

5-*Siyonistler Osmanlı'yı Nasıl Yıktı-1923*
*[Siyonîstan Çawa Dewleta Osmanî Rûxand].* (Derin Tarih, 2013: h. 15)

## 12. ENCAM

Geşepêdan û bûyerên sedsala 19an, ji aliyê civakî û siyasî ve di nav Împaratoriya Osmanî de qrîzeke kûr peyda kiribû. Digel vê, belavbûna pêla netewetiyê û bandora wê ya li ser miletên nava Împaratoriyê roj bi roj zêdetir dibû. Bi tevî hewldana hemû îslahet û çaksaziyan, piraniya miletên Xirîstiyan ên Ewrûpaya Rojava û Balkanî, di vê sedsalê de ji Împaratoriyê veqetiyan. Rûdanên siyasî û civakî yên destpêka sedsala 20an û pêvajoya Şerê Cîhanê yê Yekem, pêla cûdabûnê gihande nav miletên Misilman. Siyaseta "Panîslamîst" û "Îttihadê Osmanî" ya Ebdulhemîdê II., nekarî pêşî li veqetandina miletên Misilman bigire. Geşbûna fikra neteweyî û veqetadina miletên din, tesîreke girîng li ser miletê Kurd jî kir. Ragehandina Meşrûtiyeta Duyem, rewşeke nû anî meydanê. Di vê demê de, êdî rewşenbîr û siyasetmedarên Kurdan peyderpey ji fikra "Îttihadê Osmanî" dûr ketin, rêxistinên xwe damezirandin, dest bi weşana kovar û rojnameyan kirin. Pêdiviya vê yekê, sih sal beriya çapkirina Serbestî, ji aliyê Hecî Qadirê Koyî ve bi van hevokan hatibû destnîşankirin: *"Sed qa'îme û qesîde kes naykirrê be pûlê/ Rozname û cerîde kewtote qîmet û şan."* (Koyî (Çapa Dijîtal 2004), Nefel) Rojnameya *Serbestî* jî, yek ji berhemê wê demê ye ku bi rêvebiriya Mewlanzade Rifat hatiye weşandin. *Serbestî*, dijberê îstibdad û desthilatdariya îtihadparêzan, bi tevî muxalefeta giştî ya wê demê, heta destpêka Şerê Cîhanê ê Yekem têkoşîneke dijwar dikin.

Çawa ku li jorê jî hate gotin, di beriya destpêkirina Şerê Cîhanê de weşana *Serbestî* ji aliyê desthilatdariya siyasî ve tê rawestandin. Şerê Cîhanê ê Yekem, dibe helqeya dawî ya Împaratoriya Osmanî. Di dema mutarekeyê de kesayetiyên Kurd ên ku serkêşiyê dikin û pêşiyê derdikevin meydana siyasetê, yek ji wan jî Mewlanzade Rifat e. Ew, di vê demê de serok û damezrînerê Partiya Gel a Radîkal e û paşê dibe endamê navendî yê Komela Pêşxistina Kurdistanê û rojnameya *Serbestî* jî wek weşanek rojane ya Komela Pêşxistina Kurdistanê, di çarçoveya siyaseta rêxistinê de ji nû ve tê weşandin. Di nav rojnamegeriya wê demê ya Kurdan de *Serbestî*, rojnameyek rojane ya

herî temendirêj e ku pêşiyê di xeteke muxalif a serbixwe de hatiye weşandin û paşê bi gêrêdayî rêxistineke neteweyî ya Kurd ve hatiye weşandin. Weşana rojnameya *Serbestî* di rêvebiriya Mewlanzade Rifat de, ji diwanzdeh salan bêtir dewam kiriye, lewma navê *Serbestî* û Mewlanzade Rifat bi hev re bûne yekpare.

Mewlanzade Rifat, di hemû jiyana xwe de bi karê rojnamevanî, siyasetmedarî û çapemeniyê re mijûl bûye, yek ji şexsiyetên herî balkêş ê tevgera kulturî û siyasî ya Kurd e. Ew, bi fikrên xwe yên pirrlayenî û muxalif tê naskirin û serkêşiya derxistina gelek kovar û rojnameyan kiriye. Ji ber vê yekê bûye hedefê zixt û zordariyên desthilatdariya siyasî ya îstibdada Ebdulhemîdê II. û rêxistina Îttihad û Tereqqîyê, gelek caran hatiye destgîrkirin û sirgûnkirin.

Ji xebat û çalakiyên Mewlanzade Rifat diyar dibe ku ew, têkoşerekî sînornenas û evîndarê azadiyê bû. Van taybetiyan di bîranînên xwe de wiha tîne ziman: “Ez evîndarê hurriyeteke bêsînor im, ez dixwazim hemû welatî û hemû mirov, heta dixwazim hemû benî beşer; bi tevî nijadên spî, zerik û reşik giş bibin hevparê evîna me.” (Rifat, 2009: 60-61) Mewlanzade Rifat wek evîndar û têkoşerekî doza rewa ya miletê Kurd û hurriyetê, di rêya vê xebata dûrûdirêj a bênavber de, 8ê Îlona 1930ê li bajarê Helebê di 71ê saliya xwe de çû ber dilovaniyê.

## 13. ÇAVKANÎ

### 1. Pirtûk


Bardakçı, M. (2014). *İttihatçı'nın Sandığı*, İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları

Beysanoğlu, Ş. (2001). *Anıtları ve Kitabeleriyle Diyarbakır Tarihi (Cumhuriyet Dönemi)*, cild: 3, Ankara: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları

Birinci, A. (2001). *Tarih Gölgesinde Meşâhir-i Meçhûleden Birkaç Zât,* İstanbul: Dergâh yayınları

Birinci, A. (2001). *Tarih Uğurunda Matbuat Âleminde Birkaç Adım,* İstanbul: Dergâh Yayınları

Cemîl Paşa, E. (1992). *Muhtasar Hayatım*, (Çapa Duyem), Ankara: Beybun Yayınalrı,

Cemîl Paşa, Q. (Zinar Silopî). (2007). *Doza Kurdistan,* Diyarbekir: Weşanên Bîr

Cevdet, Dr. A. (2002). *İttihad Yolu*, A. Meretowar (Amadekar), *Rojî Kurd* (j. 2, r.51-52), İstanbul: Weşanên War

Dêrsimî, Dr. Nûrî. (1997). *Hatıratım (*Çapa Yekem), İstanbul: Doz Yayınları

Göldaş, İsmail. (1991). *Kurdistan Teâlî Cemiyeti* (Çapa Yekem), İstanbul: Doz Yayınları

Hanioğlu, Dr. M. Şükrü. (1981). *Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi*, İstanbul: Üçdal Neşriyat

Hişyar, Hesen. (1999). *63 yıl sonra Şeyh Said direnişi*, War (h. 8, r. 22-36), İstanbul: Weşanên War

Hür, Ayşe. (2011). *Resmi tarihin hainleri: 150'likler,* Taraf gazetesi

Şaweys, Îsmaîl Heqî. (2005). *Komîteya Îstîklala Kurdistanê* (Wer. R. Lezgîn), Bîr (h. 2, r. 35-40), Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Perwerde

Jongerden, Joost. (2008). *Türkiyede İskan Sorunu ve Kürtler*, İstanbul: Vate Yayınları

Jwaideh, W. (2014). *Kürt Milliyetçilinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi* (Çapa Heştem) (İ. Çekem & A Duman, Wer.). İstanbul: İletişim Yayınları

Karay, Refik Halit. (2009), *Bir Ömür Boyunca*, İstanbul: İnkılap Yayınları

Malmîsanij. (2000). *Cizîra Botanli Bedirhaniler* (Çapa Duyem), İstanbul: Avesta Yayınları

Malmîsanij. (1991). *Said-i Nursi ve Kürt Sorunu*, Sweden: Weşanên Jîna Nû

Mesut, Ahmet. (1992). *İngiliz Belgelerinde Kurdistan* (1918-1958), İstanbul: Doz Yayınları

Mojab, Shahrzad. (2005). *Devletsiz Ulusun Kadınları*, İstanbul: Avesta Yayınları

Mumcu, Uğur. (1991). *Kürt İslam Ayaklanması (1919-1925)*, Ankara: Tekin Yayın Evi

Nacim, Abdurrahman. (1309/1891-1892). *Gulzarı Asar,* Beyrut: Beyrut Edebiye Matbası

Mazıcı, Nurşen. (1984). *Belgelerle Atatürk Döneminde Muhalefet (1919-1926*), İstanbul: Dilmen Yayınevi

Passport Control Department, foregin office, February 6, 1929, S. 36141

Olson, Robert. (1992). *Kürd Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Ankara: Öz-ge Yayınları

Öngider, Seyfi. (2003). *Kuruluş ve Kurucu Bir Gayri Resmi Tarih Çalışması*, İstanbul: Aykırı Yayınları

Rifat, Mevlanzâde. (2010) *31 Mart; Bir İhtilalin Hikayesi* (Çapa Sêyem) (Wer. Berîre Ülgenci). İstanbul: Pınar Yayınları

Rifat, Mevlanzâde. (2009). *Sürgün Hatıralarım*. (Amadekar: Mithat Kutlar), İstanbul: Avesta Yayınları

Rifat, Mevlanzâde. (2000), *Türkiye İnkılabının İçyüzü* (Çapa Duyem), İstanbul: Pınar Yayınları

Rojî Kurd-1913. (2002), İstanbul, Weşanên War

Paşa, Şerif. (1990). *Bir Muhalifin Hatıraları,* İstanbul: Nehir Yayınları

Şimşir, Bilal. (2009). *Kürtçülük*: *1787-1923* (Çapa Sêyem), İstanbul: Bilgi Yayınevi

Tevfik (Özzorluoğlu), Süleyman. (2011). *II. Meşrutiyet'ten Cumhuriyet'e: Elli Yıllık Hatıralarım,* Hazırlayanlar: Şaban Özdemir-Tahsin Yıldırım, İstanbul: Dün Bugün Yarın Yayınları

Tunaya, Tarık Zafer. (2010). *Türkiye'de Siyasal Partiler, Cild:2* (Çapa Çarem), İstanbul: İletişim Yayınları

Tunaya, Tarık Zafer. (2010). *Türkiye'de Siyasî Partîler, Cild: I* (Çapa Çarem), İstanbul: İletişim Yayınları

Zürcher, Erik Jan. (2005). *Savaş, Devrim ve Uluslaşma*, İstanbul: Bilgi Üniversitesi Yayınları

**2. Kovar û Rojname**

*Derin Tarih* (Haziran 2013), h. 15, İstanbul

*Hetavî Kurd* (5ê Teşrîna Ewel 1913). h. 1, İstanbul

*Hetavî Kurd* (1913). h. 2, İstanbul

*Kürt Tarihi* (Ağustos-Eylül 2011), h. 8, İstanbul

*Serbestî* (3 Teşrînisani1324), h. 1, Constantinople

*Serbestî* (5 Teşrini Sani 1908), h. 3, İstanbul

*Serbestî* (1326-1918), h. 172, İstanbul

*Serbestî* (16 Kanun-i Evvel 1918). h. 176, İstanbul

*Serbestî* (21 Kanun-i Evvel 1918), h. 181, İstanbul

*Serbestî* (25 Kanun-i Ewel 1918), h. 185, İstanbul

*Serbestî* (26 Kanun-i Evvel 1918). h. 186, İstanbul

*Serbestî* (28 Kanun-i Evvel 1918), h. 188, İstanbul

*Serbestî* (2 Kanun-i Sani 1919), h. 193, İstanbul
*Serbestî* (7 Kanun-i Sani 1919), h. 198, İstanbul
*Serbestî* (22 Şubat 1919), h. 209, İstanbul
*Serbestî* (23 Şubat 1919), h. 210, İstanbul
*Serbestî* (24 Şubat 1919), h. 211, İstanbul
*Serbestî* (7 Nisan 1919), h. 462, İstanbul
*Serbestî* (19 Nisan 1919), h. 470, İstanbul
*Serbestî* (25 Nisan 1919), h. 476, İstanbul
*Serbestî* (26 Nisan 1919), h. 477, İstanbul
*Serbestî* (28 Nisan 1919), h. 479, İstanbul
*Serbestî* (29 Nisan 1919), h. 480, İstanbul
*Serbestî* (30 Nisan 1919), h. 481, İstanbul
*Serbestî* (1 Mayıs 1919), h. 482, İstanbul
*Serbestî* (2 Mayıs 1919), h. 483, İstanbul
*Serbestî* (3 Mayıs 1919), h. 484, İstanbul
*Serbestî* (4 Mayıs 1919), h. 485,İstanbul
*Serbestî* (5 Mayıs 1919), h. 486, İstanbul
*Serbestî* (6 Mayıs 1919), h. 487, İstanbul
*Serbestî* (7 Mayıs 1919), h. 488, İstanbul
*Serbestî* (8 Mayıs 1919), h. 489, İstanbul
*Serbestî* (9 Mayıs 1919), h. 490, İstanbul
*Serbestî* (10 Mayıs 1919), h. 491, İstanbul
*Serbestî* (11 Mayıs 1919), h. 492, İstanbul
*Serbestî* (14 Mayıs 1919), h. 495, İstanbul
*Serbestî* (15 Mayıs 1919), h. 496, İstanbul
*Serbestî* (20 Mayıs 1919), h. 497, İstanbul
*Serbestî* (21 Mayıs 1919), h. 498, İstanbul
*Serbestî* (20 Nisan 1920), h. 595, İstanbul
*Serbestî* (21 Nisan 1920), h. 596, İstanbul
*Serbestî* (22 Nisan 1920), h. 597, İstanbul
*Serbestî* (23 Nisan 1920), h. 598, İstanbul
*Serbestî* (24 Nisan 1920), h. 600, İstanbul
*Serbestî* (25 Nisan 1920), h. 601, İstanbul
*Toplumsal Tarih* (Nisan 2010), h. 196, İstanbul

**3. Malper:**

http://www.kovarabir.com, 19.11.2013
http://www.nefel.com/epirtuk, 25.11.2016
http://web.firat.edu.tr, 20. 03. 2015
http://www.Newroz.com, 10ê Sibata 2008
http://www.ttk.gov.tr/, index.php?Page=Sayfa&No=385